Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 925 19-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Gerdûn li qada Higgsê ava bû

Gerdûna ku di encama Teqîna Mezin de dest pê kir, li qada Higgsê veguherî rastiyê, ava bû.

Sala 2013'an li Navenda Fîzîkê ya Partîkulan a Ewropayê (Cern) ceribandinekê dest pê kir. Armanca esasî ya vê ceribandinê ew bû ku bê fêhmkirin, bê giraniya madeyê çawa çêbûye, avaniya madeyê çawa ye û hêza ku madeyê, her wiha hêza ku madeyê bi hev re dihêle çawa ye.
Di encama vê ceribandinê de ku sala 2019'an qediya, perçikên cuda li qada Higgsê bandor li hev kir û hate tespîtkirin ku perçikên navê bozon lê tê kirin û giraniyê dide madeyê diafire.
Bi vî rengî hate tespîtkirin ku mekanîzmaya Higgsê giraniyê dide perçikên bingehîn. Vê yekê di heman demê de teoriya guharbariya taybet a Einstein, lewma jî modela gerdûna Big Bengê piştrast dikir.
Bozonê Higgs weke 'qada Higgs'ê tê pênasekirin. Qada Higgsê tê wateya temamiya qada gerdûnê û li vê qadê jî mekanîzmaya Higgsê dixebite.
Hemû perçikên li cîhana Qûantûmê jî di nava vê qadê de tevdigerin.
Li qada Higgsê ku gerdûn bi temamî di nav de ye û nayê dîtin, perçikên ku giraniyê diafirîne bi lezên ji hev cuda tevdigerin û bi vî rengî gerdûnê ava dikin.
Li gorî vê teoriyê, li qada Higgsê ku hemû hebûneyên zindî yan jî ne zindî di nav de vediguherin rastiyê, qadeke tevgerê heye.
Hebûne li vê qadê dibin rastî. Jiyan li vê qadê dewam dike.
Bi vê qadê re pêwendiyê datînin û bi vî rengî atomên perçikan, lewma jî gerstêrk, stêrk û dawiya dawî jî em ava kirin.
Tê texmînkirin ku gerdûn piştî teqîna mezin bûye xwedî avaniyeke sîmetrîk (her aliyên xwe weke hev e).
Li gorî vê yekê, piştî ku feza dirêj bû û gerdûn sar bû ev sîmetrî xera bû, yekane hêza ku gerdûn tevdigeran cihê xwe da gelek hêzan.
Li Cernê, dema ku zanyaran sira avabûna gerdûnê eşkere kirin, her wiha destpêkê ya tevgera timî ya li gerdûnê ye.
Guhertin û veguhertinên bi vê sîrkulasyonê pêk tên, gilokek ji tevnên bêdawî ye.
Sîstemên civakî mîna li gerdûnê li dora şer û nakokiyên piralî hebûna xwe dewam dikin.
Kaosa ku bi vî şerî rû dide, pêvajoyên guherîn û veguherînê jî ava dikin.
Mîna li gerdûnê, weke li qada Higgsê ku sîmetriya di dema avabûnê de çêbû hiya civakî de pêwendiyê bi hev re datînin, bandorê li hev dikin, dibin xwedî nasname, civakê diafirînin û nexşeyeke hevpar a jiyanê ava dikin.
Nirxên civakî yên ku mîna tevnekê wan bi hev ve girê dide, jiyana wan bi wate dikin û nasnameya wan diyar dikin.
Ev rewş di heman demê de rastiya avabûna gerdûna civakî ye û hevsengiyeke gerdûnî ye.
Dema ku mirov bala xwe dide ser



tespît kirin ku li cîhanê her made xwedî antî madeyê ye, di navbera made û antî madeyê de sîmetriyek heye.
Keşfên di vê serdemê de li cîhana Qûantûmê hatine kirin, dibin sedem ku pêlên nû yên felsefî, lêgerînên nû û guhertinên paradîgmayî pêk werin.
Di vê çarçoveyê de felsefeya Diyalektîk Materyalîst ku hebûna gerdûnî vedibêje, di heman demê de li felsefeya Qûantûmê tê.
Li gorî pîvana diyalektîkê gerdûn li ser narkokiyan û dijberan ava bûye. Tevgera enerjiyê ya li nava madeyê hêza şikand û giranî da cisim, bandora gelek hêzan van pêvajoyan mîna tevnekê digihîne hev û pêkhateyên wê çêdikin.
Lewma mirov dikare bêje ku rêveçûna xwezayî ya jiyana civakî û rêveçûna li gerdûnê dişibin hev.
Civak ji hêman û nirxan pêk tê ku bingeha hebûnê çêdikin û pêwendiya bi hev re destnîşan dikin.
Ev hêman û nirx mîna çerxên makîneyekê digerin û avaniya civakî jî hertimî dikin.
Kesayet jî mîna perçikên li qada Higgsê vediguherin rastiyê, di nava avadîroka civakan, dibîne ku serdest timî dest li vê hevsengiya xwezayî werdidin û xera dikin.
Di encama vê destwerdana serweriye de pêkhateyên ku cihêrengiyê û zindîbûnê didin jiyanê hatine kezaxtin, ji rêveçûna xwe ya xwezayî û qadên azadiyê dûr ketine.
Mîna ku di qanûnên rêveçûnê yên gerdûnê de heye, jiyana civakî jî xwedî wê potansiyelê ye ku dema destwerdana serweriyê ji holê bê rakirin, di nava hevsengî û ahengiya cihêrengiyê de hebûna xwe dewam bike. Lewma li dijî destwerdanên serwer û desthilatdarîperest, têkoşînên azadî û wekheviyê, xwedî wê rolê ne ku qada Higgs a Civakî bi wate dike.
Bi vê çarçoweyê têkoşînên civakî yên serdema me ji nêzîktêdayinên ku tenê li ser çînayatiyê têne rûniştandina wêdetir di nav cihêrengiyê de yekîtiyê didin pêş. Eynî weke lihevhatina cihêrengiya gerdûnî ya bi sirûştê re.
Eynî weke rastiya gerdûnê ku bi Teqîna Mezin çêbûyî û weke parçeyên li qada Hîggsê ya ku gerdûn afirandî dibin xwedî giraniyekê, têkoşîna çewisandiyan jî wê potansiyela afirandê ya li ser hîmê wekhevîxwaz û azadîxwaziyê di xwe de vedihewîne.
Çerxan hûtayî ya enerjiyê ku giyanê madeyê pêk tîne, zindîtiyekê dide gerdûnê.
Nakokî û pevketinên mezin ên li gerdûnê, terisîna lêgerîna li azadiyê ne ku di rihê madeyê de hene.
Reaksiyona parçeyên bin atomî ku li diî hêza hepiskar nîşan didin, dibine peymanberê teq3inên mezin, guherîn û veguherînê.
Cîhaneke wiha ku enerjiyeke li di bedena xwe venahewe, tim li azadiyê digere bi hêza pêjnkirinê afirandî... Cîhana azadiyan. Ya hewce fikireke rast û rêbertiya rêxistinî ye.
Felsefeya Ekolojîk û Azadîxwaziya Jiyanê ya Demokratîk ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi hedefa ku cîhaneke wiha biafrîne danî holê, bersiveke girîng e li hevsenga sirûştî ya jiyana civakî...

***OZGUR POLÎTÎKA***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Hêman | Bingeh, hîm, xîm, esas. Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye. |
| Koalisyon (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| Restore (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| Rêgez. | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Mirovekî xwedîrêgez e. |
| Stad/Stadyom (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe: Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| Tîm (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din. Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| Turnuva (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidarxistin. Mûsabeqe. |
| Tûnel (Fransî) | Riya di bin erdê de, riya hawîrdorê wê girtî. Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| Werziş | Spor. |
| Werzişvan | Kesê sporê dike. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | A | C | ■ | Ş | Ê | T | ■ |
| 2 | B | A | W | E | R | Î | ■ | R | A |
| 3 | Î | Z | ■ | R | ■ | R | E | ■ | Q |
| 4 | S | A | F | A | R | Î | ■ | A | A |
| 5 | ■ | D | E | H | ■ | N | E | V | Î |
| 6 | P | ■ | D | Î | K | ■ | Y | ■ | T |
| 7 | A | L | Î | ■ | A | B | ■ | M | ■ |
| 8 | L | A | ■ | K | L | Î | N | I | K |
| 9 | E | M | R | ■ | O | ■ | A | R | Î |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | ■ | | | | ■ | | |
| 2 | | | | | | ■ | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 4 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 6 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 8 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | | ■ | | | | | | | ■ |

### ÇEP-RAST

1. Sir, tiştê her kes pê nizane... Baneşana kêfxweşiyê
2. Navbera du tiştan... Bi erebî "ez"
3. Rengek
4. Jimarek
5. Sala em tê de ne... Agir
6. Kurteya elementa Aktînyûmê... Her tiştê têkildarî debara jiyanê
7. Kurteya elementa hesin... Beşeke malê, jûr... Kar û xebat
8. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Genimê hêrayî
9. Bajarekî me

### JOR-JÊR

1. Ji bo bûkê, birayê zavê... Davik
2. Xwîşka bavê mirov... Aleta ku demê nîşan dide
3. Diravên ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tên standin... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê
4. Dijberê rengî spî
5. Cihê herî kûr yê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Mehek
6. Lîstikeke ku bi neh keviran tê lîstin
7. Dûxan
8. Yekeya giraniyê ku li Fransa 30,59 gr, li Ingilistanê 28,349 gr û li Holanda 100 gr e... Xweliya piştî şewatê
9. Kurtebêja Ksenonê... Pirsgirêk



## Xiyaneta Enkîdo di şexsê PDKê de hê zindî ye

Kiryarên PDKê ji xiyanetê wêdetir in û ji bo berjewendiyên xwe= tişta neke nîne.

## Ciwanên Efrînî yên tevlî nava refên PKK'ê bûyîn, bang kirin

Komek ji ciwanên Efrînê daxuyaniyek da û got, "Ji bo azadiya Rêber Apo, ji bo hilanîna tola şehîdên Kurdistanê, li dijî destavêtin û destdirêjiya li gel û xaka me, em tevlî nava refên PKK'ê bûne." ***R-4***



Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 925 19-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Dixwazin bi qirkirina civaka Êzîdî dîroka Kurdan ji holê rakin

Bi sedê salan e li ser civaka Êzîdî êriş tên kirin. Bi taybetî piştî ku Êzîdiyan li Şingalê rêveberiya xwe ava kir, rojane êriş li ser wan tên kirin. Heta niha ne 74 komkojî tenê rojane çêdibin û her êriş weke komkojiyekê ye. ***R-2***



# SERKETINA GERÎLA SERKETINA NETEWEYA KURD E

Gerîla hêzeke xwebexş e ku bi dehê salan e bê westan, bê rawestan û bi lehengiyeke mezin ji bo azadiya her çar başên Kurdistanê têkoşîneke bêhempa dike. Vê hêzê Kurd hem ji tinebûnê rizgar kirin, hem kirin gelekî berxwedêr û têkoşer. Hevseroka PYD`ê ya bajarê Qamişlo Dilşa Şawîş li ser rola gerîla nirxandin kir û banga xwedîderketina li gerîla kir R-5







## Meclisa Malbatên Şehîdan 151 şehîdên Dêrikê bîr anîn

Meclisa Malbatên Şehîdan li Dêrikê 151 şehîdên di salên cuda de û li cihên cuda şehîd bûyîn bîr anîn û da zanîn ku Meclisê piştrast kir ku şehîdan riya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ronî kiriye. ***R-3***



## Li Kampa Waşokanî hezar û 320 kes bi laşmanya ketine

Piştî belavbûna nexweşiya laşmanya li kampên bakur û rojhilatê Sûriyê, Heyva Sor a Kurdî û Desteya Tenduristiyê ketin nava hewldanê. Li kampa Waşokanî ku 15 hezar kes lê dimînin, hezar û 320 kes nexweş in. ***R-6***



## Derhêner Altay: Divê em li kurdî xwedî derkevin

Derhêner Veysî Altay bal kişand ser zor û êrişên li ser ziman, çand û hunera kurdî û got, "Berî her tiştî divê em li çand û zimanê xwe xwedî derkevin." ***R-7***

# Plansaziya Desteya Hundir ya têkildarî jinan hat eşkerekirin

**Têkildarî biryarên civîna salane ya jinan ya Desteya Hundir ya Herêma Cizîrê, cîgira Hevserokatiya Desteya Hundir got "Biryarên me yên sala 2022`yan têkildarî pêşxistina aboriya jinan di nava saziyan de, zêdekirina perwerdeyên akademîk û destpêkirina hemleyên derbarê madeyên hişbir û fihûşê de ne."**



Desteya Hundir ya Herêma Cizîrê civîna salane ya jinan bi amadebûna nêzî 250 endaman li Qamişlo li dar xist. Di civînê de mijarên rêxistinî, kar û xebatên salê û plansaziya sala 2022`yan hatin nîqaşkirin.
Têkildarî mijarê cîgira Hevserokatiya Desteya Hundirîn a Herêma Cizîrê Hemrîn Elî got civîn bi nîqaşeke baş derbas bû û da zanîn ku di sala 2021`an de Hêzên Ewlekariya Hundirîn-Jin roleke bibandor di nava civaka xwe de lîst.
Hemrîn Elî got: "Asayîşa Jinan li hemberî hemû diyardeyên neaxlaqî bû bersiv. Di pêngavên ewlehiyê yên li kampa Holê de cih girt ku ew pêngav li hemberî teroreke mîna DAIŞ`ê bû û rojane ji bo ewlehiya kampê kar û xebatê dike."
Hemrîn Elî diyar kir ku Asayîşa Jinan cihê xwe di nava hemleya paqijkirina taxa Teyî ya li Qamişloyê de jî girt û di heman salê de hemleyeke berfireh ji bo rêgirtina li ber fihûşê pêk anî.
Hemrîn Elî got: "Di sala borî de di pêşxistina projeyên aboriya jinan a taybet bi beşên Desteya Hundirîn de lawazî hebû, projeyên jinan tune bûn, ev yek cihê kêmasiyê bû. Biryareke ku me ji bo sala 2022`yan daye, pêşxistina aboriya jinan e."
Têkildarî plansaziya sala 2022`yan, cîgira Hevserokatiya Desteya Hundirîn a Herêma Cizîrê Hemrîn Elî da zanîn ku wan 26 biryar dane û wiha vegot: "Ji wan biryaran ev hene; pêşxistina asta perwerdeya akademîk û destpêkirina hemleyên belavkirina zanînên der barê fihûş û madeyên hişbir de."
*ANHA*

# Dixwazin bi qirkirina civaka Êzîdî dîroka Kurdan ji holê rakin

**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi hezarê salan e li ser civaka Êzîdî êriş tên kirin. Bi taybetî piştî ku Êzîdiyan li Şingalê rêveberiya xwe ava kir, rojane êriş li ser wan tên kirin. Heta niha ne 74 komkojî tenê rojane çêdibin û her êriş weke komkojiyekê ye.
Herî dawî 3`yê Tebaxa 2014`an DAIŞê fermana 74`an bi serê civaka Êzîdî de anî. Wê demê hêzên hikûmeta Iraqê û yên başûrê Kurdistanê, dev ji gelê Şingalê berdan û Êzîdî bi tena xwe hiştin. Bi hezaran mirov hatin kuştin. 5 hezar jin hatin revandin û wek kole li sûkan hatin firotin.
Li hemberî qirkirinê gerîlayên azadiyê, YPG û YPJ bi berxwedana xwe, li gelê Şingalê xwedî derkeftin û ji bo rizgarkirina Şingalê li hemberî DAIŞ'ê şer kirin. 13`ê Mijdara 2015`an Şingal ji DAIŞ'ê rêzgar kirin. Piştî rêzgarkirinê



bi demekê Êzîdiyan hêza xwe ya bi navê Yekîneyên Berxwedana Şingal (YBŞ) ava kir û ji wê demê ve bi hêza xwe ya cewherî parastina xwe dikin. Lê niha jî êriş li ser vê hêzê hene. Piştî avakirina hêza Şingalê PDK'ê nerazîbûna xwe li hemberî wê diyar kir û bi dehê caran êrişî YBŞ'ê kir û heta niha jî bi nerazîbûna xwe piştgirî û derfetê dide dewleta tirkî ku êrişî Şingalê bike. Jixwe dewleta tirkî ya faşîst bi dehê caran êrişên hewayî li ser Şingalê kirine û bi dehan ji gel û ji endamên parastinê şehîd xistine. Bi piştgiriya PDK'ê û hikûmeta Iraq'ê Şingal xistine nava dorpêçê. Ji bo wê jî êrişên dagîrker û xayînan li ser Şingalê dewam dikin. Berî çend rojan jî Tirkiyê êrişî Şigalê kir û di encamê de Hevserokê Meclisa Pêkanînê ya Şingalê Merwan Bedel şehîd xistin.

**`Em li ser xaka xwe ne, tenê aştî û azadiyê dixwazin`**

Derbarê mijarê de Hevseroka Mala Êzîdiyan ya herêma Cizîrê Leyla Îbrahîm êrişên dewleta tirkî yên ser Şingalê şermezar kirin û wiha got: "Her kes dizane ku civaka Êzîdî di 74 fermanan de derbas bûye. Berî niha bi destê dewleta Osmanî komkojî li ser me dihatin kirin. Niha jî Tirkiye li şûna Osmaniyan komkojiyan didomîne û Êzîdî li ku hebin êrişî wan dike. Tirkiye êrişên hovane bi ser gelê me yê Şingalê de tîne. Ev êriş bi zanebûn tên kirin. Çimkî di çanda Êzîdiyan de dîrokeke veşartî heye. Tirkiye Êzîdiyan wek stûneke Kurdan dibîne, ji bo wê her tim dixweze Kurdên Êzîdî qir bike. Heta niha êrişî Şingalê dikin û dixwazin fermaneke din bi serê me de bînin. Hikûmeta Iraqê û ya başûrê Kurdistanê jî qirkirin û tinekirina me dixwazin. Wek civaka Êzîdî em ti caran nêzî kesekî nebûne û me mafê ti kesî nexwariye. Em li ser xaka xwe ne, tenê aştî azadiya xwe dixwazin. Mixabin dewleta tirkî em dane ber çavê xwe. Çimkî baş dizane ku em Kurdê resen in û dîroka Kurdan e. Eger me qir bikin, dîroka Kurdan qir dikin. Mixabin êrişa dawî kesayeteke girîng kir amanc. Çi kesê ji bo Kurdan di çareseriya paşrojê de dixebite wan dike amanca xwe. Lewra dizane wê ev kes guhertin û pêşketinên mezin ji bo Kurdan çêkin."
Leyla Îbrahîm behsa xiyaneta PDKê jî kir û axaftina xwe wiha domand: "Hikûmeta başûrê Kurdistanê ti caran li gelê Şingalê xwedî derneketiye. Me dît di fermana 2014`an de çawa PDKê xiyanet li Êzîdiyan kir û di tengayiyê de dev ji wan berda û bi tenê hiştin. Heta niha jî Êzîdî wek mêvanên Şingalê dibîne. PDK bi van kiryaran ti cudayiyî di navbera xwe û Tirkiyê de nahêle. Eger wan derfet nedabûya Tirkiyê nikarîbû tiştekî bike. Lê baş tê zanîn ku destê wan di van êrişan de heye. Bila êriş bike, em ti caran bin nakevin wê her dem hêza me hebe. Çimkî me bi destê xwe hêz û rêveberiya xwe ava kiriye. Wê ti caran nikaribin vîn û hêza me bişkînin."
Hevseroka Mala Êzîdiyan ya herêma Cizîrê Leyla Îbrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Pîwîst e em hê zêdetir xwe bir êxsitin bikin, da ku em êdî derfetê nedin van êrişan. Wek jinên Êzîdî emê li pişta rêveberiya xwe bin û piştgiriyê bidin hêza xwe."

# Radyo Star FM dengê jinên bakur û rojhilatê Sûriyê

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Endama Radyo Star FM Mîdya Silêman salvegera çaran ya damezrandina radyoyê di serî de Rêber Abdullah Ocalan li tevayiya jinan pîroz kir û wiha got: "Radyoya me taybet ya jinê ye. Em deh jin tê de kar û xebatê dikin. Armanca me ji vekirina vê radyoyê ew e ku em têkoşîn û berxwedana jinê heman demê êş û azarên wê ji civakê re ragihînin. Her kes dizane cihê ku em lê dijîn hişmendiya mêrê serdest lê heye. Ne li bakur û rojhilatê Sûriyê tenê li her devera cîhanê ev hişmendî heye. Lê ji ber ku şoreşek bi navê me hatiye avakirin êriş li ser me pirtir tên kirin. Tevî ku jin êş, işkence û zehmetiyan dibîne, her tim li ber xwe dide û kedê dide. Ev hişmendî ji 5 hezar salî ve heye. Vê hişmendiyê gelek êş û azar bi jinê dane kişandin. Lê bi şoreşa Rojava û fikir û felsefeya Rêbertiyê, ji bo jinê zemînek hat avakirin. Di vê şoreşê de ne jinên Kurd tenê yên Ereb û Sûryan jî bi saya vê şoreşê xwe bi rêxistin kirin û tevlî gelek kar û xebatan bûn. Em jî hin ji van jinan bûn ku me berî çar salan Radyo Star vekir. Radyo destpêkê şeş heyvan di weşana têstê de ma. Piştî wê 15`ê Kanûnê me dest bi weşana zindî kir. Wê demê weşan ji saet heftê sibehan heta heftê êvaran bû. Pişt re saetên weşanê zêde bûn û weşan bû heta dehê êvaran. Radyoya me destpêkê li ser asta du bajaran bû, lê niha li ser pêleya 105.3 û 104.8 li ser asta herêma Cizîrê weşanê dike."

Di her warê jiyanê de jin cih digire, bi taybetî di warê ragihandinê de rola xwe baş dilîze. Radyo Star FM jî yek ji saziyên bihêz e û bi keda jinê 15`ê Kanûna 2017`an hatiye damezirandin. Heta niha jî bi deng û rengê jinê rojane bernameyên xwe pêşkêşî civakê dike.

Mîdya Silêman behsa bernameyên Star FM kir û axaftina xwe wiha domand: "Niha nêzî 24 bernameyên me hene. Bernameya jin û jiyan, ya zarokan, pêşbirk, daxwaziya stiranan, rojeva jinê, siyasî, çandî, Nûbel ku ji aliyê YPJ ve tê çêkirin, ya şehîdan, ya birîndaran, nirxên şoreşê, bernameya gundê me û ya rojbaş hene. Ji bilî bernameyan hin caran dosya û nêrîn jî hene."
Mîdya zehmetiyên ku bi wan re derbas dibin bi lêv kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dema em derbasî karê Radyoyê bûn, em ne pispor bûn, cara yekê bû me di ragihandinê de bi taybetî di Radyoyê de kar dikir. Ji ber wê me gelek zehmetî kişand. Zehmetiya herî biêş hişmendiya civakê bû; digotin jin çawa di radyoyê de heta êvaran kar dike. Lê bi demê re me ew zehmetî derbas kirin û êdî civak jî em nas kirine."
Endama Radyo Star FM Mîdya Silêman axaftina xwe wiha qedand: "Hestên me yên kêfxweşiyê ne, çimkî wek jin em di nava vê şoreşê de bi taybetî di milê ragihandinê de cih digirin û dibin dengê jinên bakur û rojhilatê Sûriyê."



# Derhêner Altay: Divê em li kurdî xwedî derkevin

**Derhêner Veysî Altay bal kişand ser zor û êrişên li ser ziman, çand û hunera kurdî û got, "Berî her tiştî divê em li çand û zimanê xwe xwedî derkevin."**



Di nava 6 salên dawî de bi destê qeyûmên ku li şaredariyên Kurdan hatine danîn, êriş li ser çand û zimanê Kurdî têne kirin. Li gel êrişên li ser ziman, lîstikên bi Kurdî têne qedexekirin, li dijî mirovên bi Kurdî diaxivin êrişên nijadperestiyê têne kirin.
Derhêner Veysî Altay têkildarî êrişên li ser çand, huner û zimanê Kurdî ji ANF'ê re axivî.

**'HESASIYETA ME YA LI SER ZIMAN TÊRÊ NAKE'**

Altay diyar kir ku ev êriş ji roja avabûna komarê û vir ve dewam dike, lê belê van salên dawî zêde bûye.
Veysî Altay ragihand ku dewleta Tirk sîstema xwe li ser tunekirina çand û hunera Kurdî ava kiriye, di heman demê de nirxên Kurdan jî kiriye malê xwe.
Altay anî ziman ku êrişa li ser ziman û çandê ji bo tunekirina civakê ye û got, "Eger ziman, çand û erdnîgariya civakekê ji dest bê girtin, hingî ew civak dikare bê tunekirin. Lewma êrişên mezin li ser ziman tê kirin. Di vê mijarê de Kurdan gelekî li ber xwe dan û di zimanê xwe de israr kirin, lê belê ev yek têrê nake. Divê mirov rexnedayina xwe bidin. Em çiqasî bi ziman re mijûl dibin? Em çiqasî dikarin girîngiya zimanê dayikê destnîşan bikin? Sazî û siyasetmedarên me ji bo ev ziman paşerojê hîn bêhtir bê axaftin hewldaneke têrker dikin an na? Ji bo bersiva li van pirsan ez teqez dibêjim 'na'. Beriya her tiştî divê em xwedî li çand û zimanê xwe yê dayikê derkevin."

**'EGER EM BIKARIN ZIMANÊ XWE BIPARÊZIN, WÊ ÊRIŞ KÊM BIBIN'**

Altay destnîşan kir ku beriya her kesî divê civaka Kurd li ser Kurdî hesasiyetê nîşan bide û got, "Carna em civînên xwe yên bi beşdariya bi sedan kesî, tenê ji bo kesekî ku bi Kurdî nizanin dikarin bikin Tirkî. Eger em li her qadê cih li zimanê xwe teng bikin, hingî em ê xwe tengav bikin. Eger em vê bikin, gelo wê kî rabe çand û zimanê me biparêze? Dema ku me zimanê xwe parast û bi pêş ve bir, hingî êriş jî wê kêm bibin. Qeyûman destpêkê êriş bir ser tabelayên Kurdî. Qeyûm dibe ku Kurd bû, lê dîsa jî destpêkê êrişî zimanê xwe kir. Lewma beriya her tiştî divê em xwedî li çand û zimanê xwe derkevin. Divê em ji însafa xelkê re nehêlin û rê û rêbazên parastina çand û zimanê xwe peyda bikin. Ji ber ku eger zimanê me bi temamî ji me bê standin hingî têkoşîna polîtîk jî wê kêm bimîne."
*ANF*

# Li Helebê pêşangeheke wêneyan



**Yekîtiya Hunermendan ya Helebê bi navê 'Çirûskên Şêwekariyê' li Hola Galerî ya Seydo Reşo pêşangeheke wêneyan vekir.**

Pêşangeha wêneyan bi armanca derxistina behreyên ciwanan hate lidarxistin. Pêşangeh li Hola Galerî Seydo Reşo ya taxa Şêxmeqsûd a Helebê hate lidarxistin. Şêniyên taxê, nûnerên saziyên sivîl û çandî beşdarî pêşangehê bûn.
Di pêşangehê de 75 tabloyên 15 wênesazan û hin berhemên destkariyê têne pêşandan.
Yek ji wênesazên ku beşdarî pêşangehê bûye Mêrvan Hebeş der barê pêşangehê de wiha axivî: "Armanca me ji lidarxistina pêşangehê ew e ku em rewşa heyî bi rêya wêneyan bi civakê bidin naskirin."



Welatiya bi navê Amna Xidiro ku beşdarî vekirina pêşangehê bû, kêfxweşiya xwe diyar kir û got: "Em di van tabloyan de jin û xwezayê dibînin. Ev yek jî bi saya kesên ku ev wêne xêz kirine û karibûn peyama xwe bi rêya wan bidin û bi rêya tabloyên xwe banga parastina xweza û jinan dikin."



Pêşangehê heta roja Înê dewam kir.
*ANHA*

# 'Rakirina destana Derwêşê Evdê ji meteryalên perwerdeyê yên başûrê Kurdistanê qirkirineke çandî ye'



Nivîskar û dîrokzanê Kurd Biradost Mîtanî got, "Kesên bi navê olê diaxivin û banga rakirina destana Derwêşê Evdê ji meteryalên perwerdeyê dikin, hewl didin çand û dîroka gelê Kurd qir bikin."
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Wezareta Perwerde û Fêrkirinê ya hikumeta Başûrê Kurdistanê ragihand ku wê xwendina destana Derwêşê Evdê ji meteryalên perwerdeyê yên sala bê rakirin û destan bi "Bêrêziya li hemberî ola islamê" wek eger nîşan da.
Yekgirtûya Îslamî di parlementoyê de derbarê gotina Derwêş ya "Ew jî ola îslamê dûr e" de daxwazî ji hikumeta başûrê Kurdistanê kir ku lêborîn ji misilmanan bixwaze.

**`DESTANA DERWÊŞÊ EVDÊ DESTANEYA PARASTINA REWA Û YEKÎTIYA NETEWEYÎ YE`**

Têkildarî mijarê nivîskar û dîrokzanê Kurd Biradost Mîtanî nerazîbûn nîşanî biryara hikumeta başûrê Kurdistanê da û got, dîrok û çanda kurdî di ser hemû baweriyan re ye.
Têkildarî girîngiya destana Derwêşê Evdê ji bo gelê Kurd Biradost Mîtanî wiha axivî: "Destana Derwêşê Evdê temsîla hezkirina xak û berxwedanê dike, her wiha şoreşa rasteqîn temsîl dike. Çîroka wê ne tenê li ser hezkirina Derwêş ji Edûlê re ye. Di heman demê de hezkirina Derwêş ji xakê re ye. Derwêş şer kir da ku parastina rûmet û hebûna kurdan bike. Ew şer şoreşeke mezin bû. Destana Derwêşê Evdî destana parastina rewa û yekitiya kurdî ye. Wê destanê îsbat kir ku tu cûdahî di navbera kurdan de çi êzidî û çi misilman bin tune ye. Ew nûnertiya dîrokekê dike ku divê di nava nifşan de were parastin û nûnertiya çand û nasnameya neteweyî dike."
Wezareta Perwerde û Fêrkirinê ya hikumeta başûrê Kurdistanê destana Derwêşê Evdî derbasî meteryalê perwerdeyê ya sala 2007 – 2008`an kir.

**`BERIYA HER TIŞTÎ DÎROK Û ÇANDA GELÊ KURD HEYE`**


Têkildarî biryara hikumeta Başûrê Kurdistanê Biradost Mîtanî ev tişt got: "Mixabin dema min biryara rakirina destanê ji meteryalên perwerdeyê yên Başûrê Kurdistanê bihîst ez pir êşiyam. Çawa dikarin dîroka têkoşerekî Kurd ku gihaşt astên şeref û rûmetê rakin. Ev şaştiyeke dîrokî mezin e ku derfetê nedin xwendekarên Kurd ku vî destana dîrokî bixwînin. Kesên ku bi navê ol diaxivin û banga rakirina vê destanê dikin mixabin ew ne welatparêz in û çarçoveya fikirên wan pir teng e. Ew dixwazin ku çanda gelê Kurd bi navê baweriyên olî, biguherînin."
Mîtanî wiha domand: "Li Kurdistanê olî û baweriyên cûda hene, lê beriya her tiştî dîrok û çanda gelê Kurd heye. Divê mirov rêzê bide vê yekê, nexasim mijarên perwerdeyê ku dibistan bûne mijarên sereke û divê bandora fikireyên cûda li wan neyê kirin. Divê em parastina çanda xwe bikin, wê qir nekin. Ez hêvî dikim ku hikumeta Başûrê Kurdistanê ji biryarê paşde bikeve."

**`DIVÊ DESTAN DI DIBISTANÊN KURDISTANÊ DE WERE XWENDIN`**

Biradost Mîtanî destnîşan kir ku bi dehan hunermendên li Kurdistanê li ser destanê strane, çîroka Derwêşê Evdî û Edûlê bûye hezkirina hemû kurdan û wiha pêde çû: "Her çiqas sîstemên desthilatdar xwestin ku kurdan di nava çandeke sexte de bihelînin, divê ev destan bibe sembola çanda kurdî û di dibistanên Rojava û Başûr de bê xwendin. Da ku kesayeteke neteweyî xwedî wêje û çanda kurdî ya rast were avakirin."

**`ÇI CÛDAYÎ HEYE KU DIJMINÊ ME ÊZÎDIYAN FÎZÎKÎ QIR DIKE Û HIKUMETA BAŞÛR DI ALIYÊ ÇANDÎ DE QIR DIKE!`**

Biradost Mîtanî bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Divê çand û hebûna êzidî werin parastin. Hikumeta Başûrê Kurdistanê bi rêya vê biryarê parçebûna di nava kurdan de zêde dike. Divê em zanibin ku qirkirina li dijî êzidiyan dûbare nebe. Çi cûdahî heye ku dijmin êzidiyan di aliyê fîzîkî de qir dike û hukemeta Başûrê Kurdistanê di aliyê çandî de qir dike."
*ANHA*



## Pîrê Evînê (1940-2021)

Sîpan Şînda

Evînî xweş evînî
Tu li dar û beran didî dihelînî
Çire tu rojê evqasî devilken î
Ji şevê û pê de ji min re cerghelînî

Heçî evîn e ne karê herkesî ye, herkes nikare barê evînê hilgire. Evîn û evîndarî karê evîndara ye, karê fedakare ye, karê mêrbaşa ye. Evîn qitîska serê jiyaneke nû ye. Evîn hesteke ku dilê mirovî dikelîne, diteqîne, dibezîne, dilerizîne ye. Dilê bi evîn be, gul û nêrgiz, sosin û beybûn di têde şîn dibin, çem û kaniyên zelal jê diherikin. Ew dil dibe bax û bostan, dehl û rez û xelkê dikişîne xwe. Dilê bi evîn weke rojê û heyîvê geş e.
Belê, em ê îro behsa kesekî dilovan, mirovakî dil bi evîn, mirovekî bê evîn nekariye bijî bikin. Ji ber wê ji navê xwe daniye Pîrê Evînê. Dengbêjekî ji nava dilê Botan derketî, evîndarê stran û dengbêjiya Kurdî, mirovekî welatperwer, Pîrê Evînê. Ew î gelek mêrg û zozan çêrandine. Avên gelek kaniyên zelal vexwarîne. Navê wî Hacî Evdila Sezaî ye. Ew di sala 1940 ê de li Cizîra Botan li taxa Torê ji dayîk dibe. Ew kurê Seîd û Fehîmê ye. Bavê wî sefar bûye û ew ji di zarokatiya xwe de gelek caran bi bavê xwe re çûye zozanan û arî bavê xwe sefarî kiriye. Ew di ciwaniya xwe de diçe başûrê Kurdistanê li Dihokê li cem mal xalên xwe û li mala xalê xwe Mihemed Arifê Cizîrî û Hesenê Cizîrî nas dike. Piştî nas kirina wî ya bi wan re, ew gelek caran diçe Bexda li cem wan û him guhdarî Mihemed Arif û Hesen Cizîrî, Îsa Berwarî dike û him ji bi wan re stranan dibêje. Piştî demekê ew li Cizîrê weke sixiye dest bi kar dike. Lê belê ew ehlê keyfê û xweşiyê bûye. Ew ji başûr bigire hetanî serhedê li welêt hamûyê digere. Ji xwe ew ji malbateke dengbêj tê. Ji bavê wî bigire hetanî mamên wî û bapîrê wî hamû dengbêj bûne. Ew dibêje dema ez zarok bûm, ez bi mamê xwe re çûme gundê Kawîs Axa û wî û mamê min bi hev re stran gotine. Ewî li gelek dîwan û şahiyan de stran gotine. Bi taybetî li nava Cizîrê de çi şahiyên çêbiyan ew di têde bî. Ew û Fatû Korê li Cizîra Botan serkaniya keyf û şahiyê bûn û wan bi hev re gelek stran gotina. Ew di heman demê de hikayetbêj û mirovekî sohbetxweş bû. Ew aşiqê bêhna xweş û siwariya hespên kihêl bû. Li Cizîrê de dema dawetek çêdibî ew her tim li serê govendê bû.
Min bi rehmetî re gelek caran civatên xweş girtine û guhdariya dengê wî, jiyana wî û dengbêjiya kiriye. Bi rastî ji ew î jiyaneke xweş jiyaye. Ew î gelek stranên Kurdî yên klasîk bi destên xwe nivîsîbûn. Ew î ji min re gotibû ku strana Cîranê ya wî ye û behsa çawa gotiye ji kiribû. Ew î gelek serhatiyên xwe ji min re gotibûn, lê ez dixwazim hema behsa yekê bikim. Dema ew sixiyetiyê dike diçe gundê Silopya Ribehiyê. Li wêdê keçikekê dibîne û dilê wî dikeve wê. Pirs dike ku keça şêx e. Pişrê ew diçe mala şêx û keçikê ji wî dixwaze. Lê belê fesad diçin dibêjin şêx ev mirovekî ne oldare, tê çawa keça xwe bidî wî. Digot "min di heyata xwe de nimêj nedikirin, keyf û şahî li kûderê hebûya ez ji li wêdê bûm. Lê belê piştî min ew keçik dît ez çûm bûm nimêjker û min her tim li pey şêx nimêj dikir. Heta şêx nimêj xilas ji dikir lê belê min dîsa dewam dikir. Xelkê ji şêx re digot ev ê henê mirovekî ehlê keyfê ye. Lê min li şêx da bawerkirin û ew î keça xwe da min."
Belê mamê Hecî, Pîrê Evînê, te jî ji nav me barkir û tu çûyî. Gora te biheşt be ew dengê te yê nerm û xweş wê her tim li ber guhê me be.
Ez Hacî Evdila Pîrê Evînê ji Cizîra Bota me,
Cîranê Melayê Cizîrî, nêzîkî Zîn û Memê Ala me

Ez pîr im, bê eyb û arî
Qedem êş, ji xeynî çavên tarî
Min mecal nema,
Bêhn bikin nêrgiz û rîhana bi şevên tarî

# Li Kampa Waşokanî hezar û 320 kes bi laşmanya ketine

**Piştî belavbûna nexweşiya laşmanya li kampên bakur û rojhilatê Sûriyê, Heyva Sor a Kurdî û Desteya Tenduristiyê ketin nava hewldanê. Li kampa Waşokanî ku 15 hezar kes lê dimînin, hezar û 320 kes nexweş in.**



Di demên dawî de li Kampa Waşokanî nexweşiya laşmanya belav bûye. Li gorî bijîşkan gelek nexweş naçin nexweşxaneyan û ji ber wê zû belav dibe. Li aliyekî din jî kêzika nexweşiyê belav dike, zêde bûye.

Kêzikê nexweşiya laşmanyayê bêhtir li herêmên çandiniyê û gundewaran belav dibe.

Ruxmî ku Heyva Sor a Kurd li Kampa Waşûkanî beşa dermankirina laşmanyayê vekiriye û derman jî lê peyda dibin, lê hejmara nexweşan li kampê zêde bûye.

Li Kampa Waşûkanî ya bajarê Hesekê 14 hezar û 714 koçberên ji herêma Serêkaniyê hene. Li Kampa Serêkaniyê ya rojhilatê bajêr jî 14 hezar û 73 koçber hene.

Endamê Rêveberiya nuqteya Heyva Sor a Kurd Mehcûb Hiso belavbûna vê nexweşiya li kampê piştrast kir û got, di demên dawî de zêde belav bûye. Hiso da zanîn ku ew û Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser nexweşan derman dikin.

Mehcûb Hiso diyar kir ku li Kampa Waşûkanî hezar û 320 nexweş hene, lê divê yên din werin dermankirin da ku pêşî lê were girtin.

Piştî ku Şaredariyê çopa derdora kampê rakir, ji ber ku dibû sedem ku kêzik belav bibe, Heyva Sor a Kurd li kampê dermanê kêzikan direşîne.

Hiso diyar kir ku Heyva Sor a Kurd bi hemleyên perwerdekirinê, welatiyên li kampê hişyar dike da ku xwe ji nexweşiya laşmanyayê biparêzin.



Mehcûb Hiso da zanîn ku sedema derengxistina başbûna ji laşmanyayê û belavkirina wê, ew e ku nexweş li gorî tê xwestin xwe derman nakin, her wiha bi rêya tiba adetî xwe derman dikin.

Hiso destnîşan kir ku rêxistinên tenduristiyê û mirovî yên li kampên Waşokanî û Serêkaniyê alîkariyê nakin, ji lew re barê navendên Heyva Sor a Kurd giran dibe.



Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê derdora milyonek koçberên ji Sûriye û panaberên ji Iraqê li 15 kampên Rêveberiya Xweser û li kampên li gundewarên bajarê Reqa û Dêrazorê, Tebqa û Minbicê bi cih bûne.

***ANHA***

# Mazot li malbatên şehîdên komkujiya El-Şiêtat hat belavkirin



**Bi insiyatîfa xebatkarên saziyên sivîl yên gundewarê rojhilatê Dêrazorê û bi desteka Rêveberiya Sotemeniyê mazot li 800 malbatên şehîdên komkujiya El-Şiêtat hat belavkirin.**

Insiyatîf ji aliyê xebatkarên saziyên sivîl ve hatiye destpêkirin û her xebatkarek 2 hezar lîreyê Sûriyê dide. Nêzî 10 milyon lîre hate berhevkirin û 700 bermîlên mazotê hatin kirîn.

Li gorî daneyan, hejmara malbatên ku divê mazot li ser wan were belavkirin 776 malbat in, ji ber vê yekê rêveberiya sotemeniyê piştgirî da ku rêjeya wê bigihêje 800 bermîlan.

Cîgirê desteya serokatiyê ya meclisa herêmê rojhilat Tariq Ebdulrehmen spasiya her kesî kir ku tev li vê însiyatîfê bûye û hêvî kir ku însiyatîfek din hebe da ku pêdiviyên zivistanê yên din jî werin peydakirin.

Casim Ebas El-Elî ji malbatên komkujiya El-Şiêtat ev însiyatîf nirxand û diyar kir ku divê destek bidome, ji ber ku hin malbat hene bê mal in û hewcedariya wan bi desteka manewî û madî heye.

Ji rêveberên Meclisa Malbatên Şehîdên Komkujiya El-Şiêtat Mihemed El-Ûbêf jî bang li aliyên peywendîdar kir ku zêdetir piştgiriyê bidin, bi taybet têkildarî vekirina baxçeyê zarokan.

Meclisa Malbatên Şehîdên Komkujiya El-Şiêtat ku sala 2019'an hatiye damezirandin, piştgiriya malbatên şehîdan bi desteka Meclisa Sivîl a Dêrazorê didomîne.

***ANHA***

## KIRYARÊN PDK Û AKP'Ê LI SER BAŞÛRÊ KURDISTANÊ



**Rûstem Başûr**

Wekî ku tê zanîn îro ji her demî zêdetir pêwîstiya gelê Kurd bi azadî û jiyana ebedî heye. Ji ber gelê Kurd ew gel e ku li beramberî hişmendiya serdestan têkoşîna azadî û wekheviyê dide meşandin.

Bêguman gelê Kurd her demî li dijî êrişên serdest, bi rola parestina hebûna xwe rabûne, ji bona doza xwe, têkoşîneje pir mezin dane ji bona ku bikaribe yekîtiya Netewî kurdî bi dest bixe. Lê mijara ku mirov hestiyar dike ew e heya niha hêza xwefiroş wekî PDK tevlî vê yekîtiyê nebûya, ji bona wê PDK her demî di dîrokê de xwe bi hin hêzên serdest wekî AKPê ve girê daye. Niha mijara ku em şîrove dikin mîrateyekî dîrokî ye ku di demên berê de Barzaniyê mezin digot: ku bê Tirk em nikarin bibin dewlet, yanî Berzaniyan Tirk ji bona xwe wekî sîber dihesibandin. Hemû armancên PDKê ew e ku bikaribe xwe li ser hebûna gelan bi çî bike û gel ê başûr di nava hevkariyekî de biqedîne. Provaqasiyonên ku dijmin nafikirîna PDK di roja me ya îro de pêk tîne.

Mirov dikare diyar bike ku ti ferq di navbera PDK û AKP'ê de nîne, ji xwe ermancên wan jî yek in û her kesê Kurd ji vê lîstoka wan xwedî zanebûn e. Ev jî ne tiştekî nû an jî veşartî ye. hevkarî û hevalbendiya wan eşkere li holê ye. Çi pilanên tirk li dijî kurdan hebe PDK wê dixe meriyetê de.

Îro jî li Kurdistanê PDK û hevkara xwe AKP di nava her cure qirêjiyan de ne ku kurdan bifetisînin, û xwe li ser mîrasê wan bi cî bike.

Dewleta Tirkan êdî hatiye li ber asta têkşikestinê, ku lewma ewqas êrîşî parastinên qadên medya û Başûrê Kurdistanê dike. Bi taybetî ji bo ku xwe li ser piyan bigire, bi desteka hêzên îxanetkar, ên mîna PDK'ê, li dijî Tevgera Azadiyê dixwaze Başûrê Kurdistan carek din dagir bike.

Lewma rojane êrîşên xwe li ser herêmê zêde dike û bi destê xayînan dixwaze armanca xwe bi ser bixe.

Eger mirov li dîrokê bi rengekî rast binêre îxaneta ku bi Enkîdoyan re dest pê dike, heya roja me ya îro di şexsê Barzaniyan de mirov bi hêsanî dikare bibîne. Serkêşiya vê xiyaneta dîrokî, bi rihetî mirov dikare bêje PDK dikişîne. Ji ber ku tê dîtin Barzanî bi hemû hêzên xwe yên şerê taybet, bi Tirkiyê re li dijî zêdegavî destkeftiyên gele Kurd di nava her cure hevkariyê de ye.

Bi vê jî namîne; heta ew gelê me yê ku ji ber şerê li Sûriyê koçberî Başûrê Kurdistanê bûne, wan ciwanên Kurd bi taybetî li beramberî Tevgera Azadiyê perwerde dike da ku pê bide şerkirin. Bi demê re hate dîtin ku di bin navê 'Pêşmergên Roj' de û di bin siya PDK'ê de, li herêmen ku hezên gerîla lê hene xwe bi cî dikin û bi awayekî bêbext û veşartî şer dikin. Mîna xiyaneta salên 1992, ji 1995'an heya bi salên 2000'an dewam kiriye dixwaze heman awayê xwe têxe bin çengê dewleta dagirker.

Ya din jî, jixwe armanca Barzanî ew e ku li Başûrê Kurdistanê nakokiyekî bixe li nava gelê Kurd û gelen herêmê. Lê belê êdî gelê herêmê vê xiyaneta wan û dîktatoriya Barzaniyan qebûl nake, heta li dijî wê di kêysa ewilî de wê rûxîne erdê. Lewra êdî eşkere ye ku ti helwestên wan li beramberî dagirkerên axa Kurdistanê nemaye. Tam berovajîyê wê xwe radestî neyarê gelê Kurd kirine. Ji bo destkeftî û berjewendiyên gelê Kurd êdî bûne xeteriyeke herî metirsîdar.

Bi heman awayî piştî hilbijartina Iraqê, PDK'ê dîsa li hemberî gelê me yê Şingalê dest bi gefan kir.

Bêguman Nêçîrvan Berzanî rojana ji hikûmeta Iraqê dixwazê destek bigire, ji bo ku êrîşî Şingalê bike û gelê me di nava qirkirinekî nû re derbas bike. Ji ber wê yekê plan dike ku Şingalê radestî Tirkan bike. Bi awayekî eşkere ji Îraqê re dibêje 'hûn çima bi ser şingalê de naçin'. Tê zanîn ku di sala 2014 an Barzanî Şungal radestî DAIŞ'ê kir, îro jî heman tiştî dike û wekî bûyerekî rewa dide nîşandan.

Ya rast mirov dibîne ku pilan dikin piştî şingalê bi dest bixîne, çawa radestî DAIŞ'ê kirin, wê careke din dîrok xwe dubare bike û şingalê radestî AKP'ê bikin, ku xweseriya gelê Şingalê tine bikin.

Bêguman ji dema ku Şingaliyan starûya xwe bi dest xistiye, PDK hebûna YBŞ'ê ya ku bi rola parestina civaka Êzîdî radibe, dibe astengeke sereke. Bi vê sedemê ye ku dixwaze hêzên ku li dijî xweseriya Şingalê ne bajone ser hêzên wê yên parestinê.

Civaka me ya Êzîdî li hemberî 74 fermanan re rû bi rû hatin, PDK bi siyaseta xwe ya ne exlaqî bi ser gelê civaka Êzîdî de diçe û ji fermanan xirabtir tîne ser wan. Ev jî bi awayekî pir mezin dişibe 3yê Tebaxê.

Di vê serdema ku em tê de derbas dibin, pêwîst gelê Kurd û yê demokrasîxwaz li hemberî êrîşên PDKê, dewleta Tirkan hişiyar bin û helwesta xwe ya dîrokî bi cî bînin, ku li hemberî êrîşen bi vî rengî yê ku li ser gelê, me tên bibin kelem.



# Meclisa Malbatên Şehîdan 151 şehîdên Dêrikê bîr anîn

**Meclisa Malbatên Şehîdan li Dêrikê 151 şehîdên di salên cuda de û li cihên cuda şehîd bûyîn bîr anîn û da zanîn ku Meclisê piştrast kir ku şehîdan riya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ronî kiriye.**



Meclisa Malbatên Şehîdan li navçeya Dêrikê ya Qamişlo 151 şehîdên di Tebax, Îlon û Cotmehê, sal û cihên cuda de şehîd bûne li stada Kornîş bi bîr anîn. Di merasîma bîranînê de malbatên şehîdan û nûnerên ji meclisên leşkerî û sivîl amade bûn.

Piştî deqeyeke rêzgirtinê malbatên şehîdan mûm li ser gorên şehîdan pêxistin û wesîqeyên şehadetê ji hêla endamê Meclisa Malbatên Şehîdan a Dêrikê Mehmûd Ehmed ve hatin xwendin.

Dûvre endama Meclisa Malbatên Şehîdan Wense Şawîş axivî û wiha got: "Şehîdan rêya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriye ronî kir ku rêveberiyeke demokratî ya hev-



beş bi rê ve bibin. Divê li hember komployên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkoşîn were bilind kirin."

Li aliyekî din jî li ser nave Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Adil Hisên bal kişand ser fedekariyên gelê kurd û got: "Gelê Kurd di oxira pêkanîna armancên şoreşê de gelek fedekarî da û gelek serketin bi dest xistin û wê yekê bandoreke mezin li qadên navneteweyî kir."

Hesen diyar kir ku bi saya fedekariyên şehîdan ew gihaştin vê qonaxa dîrokî ya ku îro tu kes nikare hebûna gelê kurd an mafên wî yên rewa înkar bikin.

Piştre sînefzyonek têkildarî dîrok û têkoşîna 151 şehîdên ku di cih û



demên cuda li çiyayên Kurdistan û Bakur û Rojhilatê Sûriye şehîd bûne, hat pêşandan.

***ANHA***

# Rêveberiya Xweser 8 zarokên çeteyên DAIŞ`ê radestî Rûsya kirin



**Rêveberiya Xweser 8 zarokên çeteyên DAIŞ`ê li kampa Holê radestî rayedarên Rûsya kirin.**

Şandeyeke Rûsya bi pêşengiya komsera mafên mirovan ya Serokatiya Rûsya Maria Lvova Belova serdana navenda Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ya li Qamişlo kir

Şande ji aliyê hevserokê daîreyê Ebdulkerîm Umer û cîgirê serokatiyê Fener El-Giêt ve hate pêşwazîkirin.

Di civîna çapemeniyê de Ebdulkerîm Umer bixêrhatina Maria Lvova Belova kir û wiha got: "Di hevdîtina me de gelek dozên girêdayî mafên zarokan hatin nîqaşkirin."

Umer diyar kir ku wan rewşa zarokên di kampên koçberan de li herêmên ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatine dagirkirin, bandora girtina deriyê sînor ê Til Koçerê, derbasbûna alîkariyên mirovî li ser zarokan di aliyê perwerde û tenduristiyê de, nîqaş kirin.

Umer wiha domand: "Me rewşa kampên Holê û Roj, kêmasiyên civaka navneteweyî di pêkanîna berpirsyariya li hember zarokan de nîqaş kirin. Em gihaştin çareseriyekê ku her dewletek erka xwe pêk bîne û welatiyên xwe vegerîne."

Umer diyar kir ku Rêveberiya Xweser di demên berê de 225 zarokên çeteyên DAIŞ`ê radestî Rûsyayê kirine û niha jî 8 zarokên din radest dike.

Her wiha Maria Lvova Belova jî spasiya Rêveberiya Xweser kir ku hevkariyê ji bo radestkirina zarokên çeteyên DAIŞ`ê dike û ev tişt anî ziman: "Ji beriya meh û nîvekê ve ez wek komsera serokê Rûsyayê ya mafên zarokan hatim erkdarkirin. Ji bo min pir girîng bû ku ez serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin da ku em bi hev re di dosyaya vegera zarokên rûsî de bixebitin."

Maria Lvova Belova piştrast kir ku bavên van zarokan zirarên mezin bi rêya çalakiyên terorî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dan lê tu gunehê zarokan tune ye, ew ne berpirsên kirinên bavên xwe ne û ji ber wê jî dê zarokan li welatê wan vegerînin.

Her wiha Maria Lvova Belova ji ber hevkariya di navbera wan û Rêveberiya Xweser de kêfxweşiya eşkere kir.

***ANHA***

# PDK'ê pira 2. jî ya Pêşxabûr girt



**PDK'ê roja Pêncşemê aliyê Pêşxabûrê yê deriyê sînor yê Sêmalka girtibû. PDK'ê pira 2. jî ya deriyê sînor girt.**

Aliyê Pêşxabûr (Başûrê Kurdistanê) ê deriye sînor ê Sêmalkayê serê sibeha roja Pêncşemê ji aliyê hêzên PDK'ê ve bi blokên metal hatibû girtin. Hêzên PDK'ê pira duduyan jî ya deriye sînor ê Sêmalkayê girt.

Li gorî agahiyên nûçegihanê ANHA yê li herêmê dayîn, hêzên PDK'ê bloken hesinî yên pirê ji hev derxistine û rê girtiye. Her wiha li ser sînor polîs bi cih kirine.

PDK'ê heta niha bersiv nedaye daxwaza malbatan a wergirtina cenazeyên şehîdan ku ev 73 roj e li Sêmalkayê çalakiyê li dar dixin û danê sibehê deriyê sînor aliyê Pêşxabûrê girtibû.

***ANHA***

# Şêniyên Kobanê şehîd Cîhad Kobanê spartin axê



**Bi sedan şêniyên Kantona Kobanê cenazeyê şehîd Cîhad Kobanê li Goristana Şehîd Dîcle bi merasimekê spartin axê.**

Bi sedan şêniyên kantonê, endamên saziyên sivîl û leşkerî û siyasetmedar beşdarî merasîmê bûn.

Cîhad Hesen (Cîhad Kobanê) di 13`ê Kanûnê de di encama qezaya trafîkê de li navçeya Til Temirê dema ku li ser erka xwe ya leşkerî bû, şehîd bûbû.

Merasîmê bi rêzgirtinê dest pê kir. Pişt re hevserokê Meclisa Kantona Kobanê Osman Simê wiha axivî: "Em di kesayeta şehîdan de azadiya xwe dibînin. Ew hêviya me ne, ji ber ku dev ji her tiştî berdane û eşqa xwe ya mezin di welat de dîtine."


Osman Simê wiha domand: "Îro em kulîlkeke din di goristana şehîdên Kobanê de diçînin. Bes e ji dagirkirina xaka me re û êdî dive şerê ji bo qirkirina me tê meşandin, were sekinandin."

Pişt re li ser navê malbata şehîd Cîhad Kobanê, Mehmûd Şêx Elî jî wiha axivî: "Me soz daye şehîd, têkoşer û Rêberê xwe ku em ê heta serkeftinê şopdarên rêya wan bin. Divê dewleta Tirk baş bizane ku serdema qirkirina Kurdan derbas bû. Em îro xwediyê hêzê ne û em ê serkeftinê bi dest bixin."

Di dawiyê de wesîqeya şehîd hate xwendin û radestî malbata wî hate kirin û cenazeyê şehîd bi dirûşman spartin axê.

***ANHA***

# Li Mabata 2 welatî hatin revandin



**Çavkaniyên ji Efrîna dagîrkirî ragihandin ku çeteyên girêdayî dewleta Tirkan ya dagîrker 2 welatî li navçeya Mabata revandin.**

Çavkaniyan da zanîn ku çeteyên girêdayî dewleta Tirkan ya dagîrker welatiyê bi navê Cîhad Mihemed Mensûr (51) ku ji şêniyên gundê Şorbê yê navçeya Mabata ya Efrînê ye, revandin.

Li gorî heman çavkaniyan, çeteyan welatiyê bi navê Ferîd Ehmed Mistefa yê ji gundê Emara yê Mabatayê jî revand û biriye cihekî nediyar.

***ANHA***

# Xiyaneta Enkîdo di şexsê PDKê de hê zindî ye

Kiryarên PDKê ji xiyanetê wêdetir in û ji bo berjewendiyên xwe tişta neke nîne.

**Mihemed Xanim-Qamişlo**



Hişmendiya hevkarî û xiyanetê ku çavkaniya xwe ji serdema Sumeran digire, heta roja me ya îro dewam dike. Ev çîna ku her tim li ser deshilatdarî û berjewendiyên xwe yên teng tenê difikire, di felaketên ku tên serê civakê de ji bo hêzên hegemon wek amûreke sereke rolê dilîze. Ev çîna ku em behsa wê dikin bi teybetî li Kurdistanê bûye wekî amûreke şerê teybet û ji milê hêzên deshilatdar ve tê bikaranîn. Mînakên wê jî pir in.

Ev çîna xayîn nahêle Kurd û şoreşa azadiya Kurdistanê bi ser bikevin. Ji bo qirkirina Kurdan çi ji destê wê tê bêminet ji dijminê Kurdan re dike. Çawa ku di serdema Enwer paşa de, hin serokên eşîrên Kurdan ji bo Osmaniyan hevkarî û xizmet dikirin. Ji bo dilxwşkirina Osmaniyan bi kêf û eşq ciwanên Kurd dişandin şeran. Heman tiştî niha jî PDK'ê dike. Pêşmergeyên xwe hemû xistine xizmeta Erdoxan û bi wan şerê gêrilayên azadiya Kurdistanê dike. Osmaniya nû vê carê Kurdan bi destê Kurdan dide kuştin û bi vî rengî dixwaze Kurdan qir bike.

**PDK azadiya xwe di firotina Kurdan de dibîne**

PDK Ji bo deshilatdarî û berjewendiyên xwe yên malbatî û eşîrî hewl dide Kurdên mayî jî bi carekê tine bike. Hewldana vê çîna xayîn ew e ku li ser kolekirin û sertewandina Kurdan, xwe bide jiyandin. Azadiya xwe di qirkirina Kurdan û tesfiyekirina tevgera azadiyê, Parstina deshilatdariya xwe jî di firotina Kurdan de dibînin. Ji ber wê em dibînin ku ji dil û can xizmetê ji Erdoxan re dike.

Dewleta tirkî ya dagîrker, ji sala 1983'an ve li başûrê Kurdistanê êrişên dagîrkeriyê didomîne. Di heman demê de bi riya kampên istixbaratî û leşkerî yên bi desteka PDK'ê ava kirîn, hewl dide li vî parçeyê Kurdistanê jî serdest be. Piştî êrişên wê yên sala 1991'ê li dijî Herêmên Parastinê yên Medya, kampên istixbaratî yên li xeta Hewlêr, Dihok û Zaxo kirin baregehên leşkerî û bi hezaran leşker û alavên leşkerî lê bi cih kirin.

**Baregehên dagîrkeriya tirkî li başûrê Kurdistanê**

Di roja me ya îro de li Bamernê, Şeladizê, Batufa, Kanîmasî, Kiribî, Sinekê, Serî, Kubkê, Kumrê, Koxê Spî, Serê Zêr, Geliyê Zaxo û Amediyê baregehên leşkerî yên dagîrkeriya tirkî hene. Li Hewlêr, Dihok, Zaxo û Amediyê jî şaxên Rêxistina istîxbaratê ya tirkî (MÎT) hene. Yek ji karên ku dewleta tirkî li başûrê Kurdistanê girîngiyê didiyê, karê istixbaratê ye. Çawa ku tê zanîn MÎT û istixbarata PDK'ê Parastin bi hev re tev digerin. Herwiha hin saziyên medya yên PDK'ê ku dewleta tirkî ji bo avakirinê destek û ked daye, di operasyonên afirandina atmosfera xapandinê de tên bikaranîn. Di nava van 'organên çapemeniyê' de kesên ku yekser ji MÎT'ê re dixebitin hene.

**PDK bi nûkirina xiyaneta xwe re hewl dide temenê xwe dirêj bike**

Berî destpêkirina şerê navxweyî yê Sûriyê, di hedefa PDK'ê de vê carê Kurdên li Rojava hebûn. Piştî destpêkirina şer, 2'yê Çileya 2012'an PDK'ê partiyên kurdî yên li Rojava vexwendin, lê bang li PYD'ê nekir. Piştî ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi pêşengiya PYD'ê hat destpêkirin, PDK'ê dest bi dorpêça fîzîkî û leşkerî kir.

Di nava çeteyên navê 'Artêşa Azad' li xwe kirîm de, yên ku êrîşa destpêkê li hemberî Rojava kirîn, çeteyên bi navê Selahedîn Eyûbî, Mistefa Barzanî û Azadî yên girêdayî PDKya li Sûriyê bûn.

2'yê Çileya 2013'an dema çeteyên El Qaîde êrişî Rojava kirin, PDK'ê deriyê sînor yê Sêmalka li Kurdên li Rojava girt. Endamê Dîwana Serokatiyê ya PDK'ê Elî Ewnî roja 10'ê Tebaxa 2013'an daxuyaniyek da û got 'Bila PYD ji xwe re deriyekî din veke.

PDK'ê li gel dewleta tirkî di heman demê de li ser sînorê Rojava xendek kolan. Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî got, "Ya ku li Rojava dibe ne şoreş e. PYD zilmê li gel dike. Li Rojava Esed bixwe heye. Pişt re destûr ji Hevserokê PYD'ê Salih Muslim re nehat dayîn ku di ser Hewlêrê re biçe Ewropa. Bi gotineke quretî PDK'ê got, "Salih Muslim dikare di ser Şamê re biçe derveyî welat.

PDK'ê 11'ê Sibata 2014'an li ser navê Rêvberiya Kurdistanê ya Federal daxuyaniyek da û ragihand, ku Rêveberiya Xweser ya li Rojava nas nakin. PDK niha jî bi destê ENKS'ê li Ewropa û deverên cuda yên cîhanê, çalakî û dîplomasiya li dijî Rojava bi rê ve dibe û herî dawî jî, deriyê Sêmalka yê sînor li Kurdên Rojava girt.

# Ciwanên Efrînî yên tevlî nava refên PKK'ê bûyîn, bang kirin

Komek ji ciwanên Efrînê daxuyaniyek da û got, "Ji bo azadiya Rêber Apo, ji bo hilanîna tola şehîdên Kurdistanê, li dijî destavêtin û destdirêjiya li gel û xaka me, em tevlî nava refên PKK'ê bûne."




Hêzên Parastina Gel (HPG) her roj bi tevlîbûnên nû xurttir dibe. Komek ji keç û xortên Efrînî bi daxuyaniyekê tevlî nava refên gerîla bûn.

Daxuyaniya ciwanên Efrînî wiha ye: "Dewleta Tirk a dagirker, qirker, faşîst, şerê qirkirina gelê Kurd wek her demê didomîne. Ji ber vê yekê her roj bi rengekî hovane êrişî jin, ciwan, gel û xaka me dike. Dewleta Tirk a faşîst û dagirker jin, ciwan, gel û her parçeyek ji vê axa pîroz tenê layîqê mirin û qirkirinê dibîne. Lewma her roj bi vê armancê kar dike. Ji bo serxistina vê armancê tevahiya hêz û derfetên xwe yên aborî, îstîxbaratî, leşkerî xistiye meriyetê. Tevî hemû hêz, derfet û her cure rê û rêbazên şerê taybet jî li çiyayên azad ên Kurdistanê li hember berxwedan û têkoşîna gerîlayên qehreman neçar maye. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê bi ruhê ciwantiya Apoyî fermana vê hêza duyemîn a NATO'yê anîne. Bi berxwedan û têkoşîna destanî tola salan ji faşîzma qirker a Tirk hiltînin. Artêşa wan li gel tevahiya teknîka serdemê jî li hemberî îrade û ruhê milîtanên Apoyî neçar bûye. Bi navê ciwanên Kurd, li pêşberî vê berxwedan û têkoşîna gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê me jî biryar dan ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin. Em gihan wê zanebûnê ku têkoşîna ji bo parastina rûmet û kerameta gelê Kurd û gelan erk û berpirsyariya me hemû ciwanan e.

Azadiya Rêber Apo ji bo me mijara hebûn û tinebûyê ye. Em jiyaneke bêyî azadiya Rêber Apo weke bêrûmetiyê dibînin û ji bo azadiya azadiya Rêber Apo, hilanîna tola şehîdên Kurdistanê û li hember her cûre destavêtin û destdirêjiya li gelê me û welatê me tê kirin bi gerîlabûnê, bi tevlêbûna nava refên PKK'ê bersivê didin. Ji ber yekane rêya rûmet û azadiyê gerîlabûne. Ji ber ku gerîla hêza parastin û mezinkirina nirx, rûmet û şerefa gelê Kurd û tevahî mirovahiyê ye.

Em di sala 44'an a damezirandina PKK'ê ku ji bo me vejina nû ye, tevlî nava refên PKK'ê dibin. Em di çerçoveya pêngava 'Dem dema Azadiyê ye' de, bi dirûşma 'Werin cenga azadiyê' tevlî nava refên gerîla dibin. Ji ber ku ev ceng cenga serfiraziyê ye, cenga rûmet û kerametê ye, cenga serketin û azadiya gelê Kurd e. Em bang li ciwanên Kurdistanê hemûyan dikin ku hûn jî werin di vê cenga rûmet, azadî û serketinê de cihê xwe bigirin.

Serketin a gerîlayên azadiya Kurdistanê ye, serketin a PKK'ê ye."



## Xanedana Barzaniyan

**Faruk Sakik**

Di sala 2003'yan de dema Amerîka hat Iraqê û desthilata Seddam roxand lê li Başûrê Kurdistanê xanedaneke nû hat avakirin. Xanedana Barzaniyan.

Malbata Barzanî, li Tirkiyê bi AKP'ê re têkildar bûn. Hemû rê û rêbazên gendelî û talanê ji wan girtin.

AKPê Riza Zarabê xwe ji wan re emsal nîşan da ku pereyên bi dest xistine çawa fermî bikin.

Tiştek din jî fêrî wan kirin ku ji sektora înşaetê û her cure îhaleyan çawa wê para xwe bigirin.

Di destpêkê de ji bo sîuletê bajarê Hewlêrê were guhartin berê xwe dane sektora înşaetê. Fîrmayên dewleta Tirk, he rroj avahiyên nû li bajarê Hewlêrê bilind kirin. Di hemû îhaleyên ku dabûn van fîrmayan ji xwe re par digirtin.

Piştî demek malbat fîrmayên xwe ava kirin. Hemû taktîk ji dewleta Tirkiyê girtibûn û li gor van taktîkan dest bi talanê kirin.

Hemû dahatiyên Başûrê Kurdistanê ji bo vê malbatê hat bikaranîn. Hikûmeta Baxdatê butçeyek ji herêma Kurdistanê veqetandibû. Dema ku ev butçe dihat Hewlêrê nîvî derbasî qaseyên malbata Barzaniyan dibû.

Li herêma Kurdistanê trenda malbatê ya dewlemendiyê çiqas bilindibû ya gel a belengaziyê jî ewqas xirabtir dibû.

Li herêma Kurdistanê dahatiyê herî mazin petrol bû. Malbat di destpêkê de ji fîrmayên petrolê yên ku ji derve hatibûn par girtin. Piştre wê fîrmayên xwe jî ava bikirana.

Roj bi roj mal û milkê malbata Barzanî li cîhanê belav bû. Û milkê malbata Barzanî ji Sûriyê heta Swîsreyê dirêj bûbû.

Li Amerîkayê li hin navenda li ser gendelî, mal û milkê malbata Barzaniya hin agahî belav dibûn.

DGCI, sotemeniya ji balafirgeha Hewlêrê peyda dike. PDK'ê bêyî ku îhale çêbibe, bi awayekî awarte îhale dabûn vê şîrketê.

Bi saya hevpeymanên Barzaniyan, cîroya salane ya DGCI'yê ku di sala 2015'an 2 mîlyon dolar bû, di sala 2017an de derketibû heta 150 mîlyon dolarî.

Çavkanî dibêjin ku Barzaniyên li Hewlêrê, ji nêvî zêdetir ên hemû îhaleyên mezin par distînin.

Nirxê van 2 milkên li Kalîforniyayê 47 mîlyon dolar bû û 2 mîlyon dolar jî bo tadîlata wê hatibû pêşdîtin.

Bûhayên zêde yên firotinê yên vîllayên li Beverly Hîllsê, dibe sedema gûmanên ku ev vîlla, bi pereyên qirêj hatibin kirîn.

Roja 7'ê Kanûna 2021'an Rojnamevan Zack Kopplin lêkolîneke xwe ya derbarê sermaya Barzaniyan ya li Amerîkayê de di rojnameya The Amarican Prospect û malpera www.prospect.org de parve kir.

Kopplin di vê çarçoveyê de, nêzî çar sale têkiliyên şîrketên Iraq û Amarîkayê lêkolîn dike. Kopplin di lêkolînê de xwe de, nelirêtî û gendeliyên rêvebiriya PDK'ê ferq dike.

Belgeyên ku hatine deşîfrekirin beşek biçûk ya vê diziyê bû. Li gor texmînên Kopplin li gelek welatên cûda nelirêtiya malbata Barzanî heye.

Li eyaleta Miami ya Amerîkayê milkeke 12 hezar metre kare ya bi nirxê 18.3 milyon dolar ya Mesrûr Barzanî heye..

Li gorî Kopllin 4 milkên Barzaniyan li Miami, Virginia, California hene û bûhayê wan jî bi komî dike zêdeyî 75 milyon dolar e.

Pereyên ku dixistin bin qeydê bi giranî di kirîna emlak de dihatin bikaranîn. Bi vî awayî li Dubaî gelek mal û milk kirin.

Piştî belavkirina van belge û zanyariyan, carek din gendelî û diziya dewlemendiyên Herêma Kurdistanê ket rojevê.

Bi sedan dosyayên dadgehkirin û cezakirina gendelkaran hene, lê heta niha jî yek kes ji wan nehatine cezakirin. Bi sedan dosyayên gendeliyê yên berpirsên bilind ên Herêma Kurdistanê bi belge û dîmen hene, lê ew îrade li wê parlemento yê nine ku wan berpirsan ceza bike.

Xanedana Barzaniyan gelê Başûr salan bi birçîbûnê terbiyekirin. Îroj gel li hember van kiryaran bertekên mezin nîşan dide. Li kolanên herêma Kurdistan dengê azadiyê bilind dibin. Gel îroj bi du wê serwet û dawlemendiya hatî dizîn û derbasî welatên dinan hatî kirin, ketî. Gel îro li ber deriyê Xanedana Barzaniyan e.



# Nîzam Eledîn Hisên: Divê Konseya Ewropa biryarên xwe yên têkildarî tecrîdê bişopîne.

Endamê PYD'ê Nîzam Eledîn Hisên got, "Em biryara Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropa erênî dibînin. Divê Konseya Ewropa biryarên xwe yên ji bo bidawîkirina tecrîda li Îmralî bişopîne."

**Jiyan Ebas-Qamişlo**



Tecrîda li Îmralî ket sala xwe ya 23'yan û herî dawî 25'ê Adara 2021'ê bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtineke 5 deqeyan çêbû ku ew jî hat qutkirin.

Parêzerên Ofîsa Sedsalê ya Hiqûqî 22`yê Mijdara borî daxwaznameyek ji 'dadgehê' re şand, da ku bi lezgînî Rêber Abdullah Ocalan û girtiyên siyasî; Umer Heyrî Konar, Hamilî Yildirim û Veysî Aktaş bibînin.

'Dadgehê' bersiv da parêzeran û da xuyakirin ku du cezayên nû li dijî Rêber Ocalan hatine dayîn û li gorî wê nahêlin parêzer heta 6 mehan û malbatên wan jî heta 3 mehan hevdîtinê bikin.

Têkildarî tecrîda girankirî ya li ser rêber Abdullah Ocalan û biryarên ku Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropayê dane, endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Nîzam Eledîn Hisên diyar kir ku hêzên navneteweyî yên ku naxwazin felsefeya Rêber Abdullah Ocalan li Rojhilata Navî belav bibe, tecrîdê didomînin.

Nîzam Eledîn Hisên da zanîn ku armanca sîstema tecrîdê ew e ku Rêber Ocalan û gelên Rojhilata Navî ji hev qut bike û wiha got: "Rêbertî li dijî tecrîda li Îmralî têdikoşe. Wî Îmralî kiriye dibistana demokrasî, aştî û azadiya jinan. Têkoşîna di vê çarçoveyê de kompoloya hêzên navneteweyî têk bir. Eger îro şoreşa Rojava ji bo tevayiya gelan çavkaniya hêviyê ye, bêguman mîmarê vê Rêber Apo ye. Pêkvejiyana gelan ya li Rojava di nava demokrasiyê de, dewleta Tirk û komplokeran ditirsîne. Bi felsefeya Rêber Apo re êdî pirsgirêka kurdî pirsgirêka cîhanê ye û divê em berxwedana îro li Îmralî tê kirin, himbêz bikin û banga azadiya fîzîkî ya Rêber Apo mezin bikin."

**ÊRIŞÎ MAFÊN GIRTIYAN DIKIN**

Nîzam Eledîn Hisên li ser tecrîda sîstematîk ya dewleta tirkî ya li Îmralî ev xal destnîşan kir: "Dewleta tirkî mafên girtiyan nade. Îro li Îmralî, Rêber Apo bi kiryarên taybet re rû bi rû ye. Daxuyaniya dawî ya parêzeran nîşan dide ku ev tecrîd û cezayê dîsîplînê gihaştiye astekê ku nayê qebûlkirin. Divê her kes li dijî sîstema tecrîdê ya dewleta tirkî tev bigere."

Nîzam Eledîn Hisên diyar kir ku paradîgmaya modernîteya demokratîk ya Rêber Abdullah Ocalan modela hêvî û rizgariya gelen li Rojhilata Navî ye û got, "Îro gelek welat hêvî û paşroja xwe di şoreşa Rojava de dibinin. Herwiha gel azadiya xwe girêdayî azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan dibînin."

**DAXWAZIYA AZADIYA FÎZÎKÎ YA RÊBER APO LI ÇAR ALIYÊN CÎHANÊ BELAV BÛ'**

Endamê PYD'ê Nîzam Eledîn Hisên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bang li cîhanê tevê kir û got, biryara Konseya Ewropa ji bo destpêkê biryareke erênî ye ku mekanîzmayeke hiqûqî ya dewleta tirkî nîne. Ji bner wê divê di qanûnan de guhertinan bike û di warê bicihanîna biryarên berî niha yên CPT û DMME de, em girîngiyê didin vê biryarê."

**'DIVÊ ÇAVDÊRIYA BIRYARÊN XWE BIKIN'**

Nîzam Eledîn got, divê Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropa biryarên xwe bişopîne û wiha dewam kir: "Bandora berxwedana mezin ya gelê me ji bo biryarê bêguman gelek e. Tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li dijî gelê Kurd e. Vê biryarê jî bêhiqûqiya dewleta tirkî careke din nîşan da. Berxwedan û têkoşîna gelê me ya ji niha û pê ve, wê xurt be û wê gelek tiştan biguherîne."

Nîzam Eledîn diyar kir ku saziyên li Rojhilata Navî dixebitin, ji bo rakirina tecrîdê divê pirtir bixebitin û banga mezinkirina têkoşînê kir.

**'EMÊ LI DIJÎ TECRÎDÊ LI KOLANAN BIN'**

Nîzam Eledîn Hisên bal kişand ser hewldanên PYD'ê yên ji bo rakirina tecrîda li ser Rêber Ocalan û got, emê xebat û çalakiyên xwe bidomînin heta ku fikir û felsefeya Rêber Ocalan bigihînin gelan."

Nîzam Eledîn Hisên got, divê gel ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bibêjin "Dem dema azadiyê ye" û dakevin qadan û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ji bo ku tecrîd bi dawî bibe û azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan pêk were, divê rêxistinên mafên mirovan yên navneteweyî jî gavên şênbertir biavêjin û biryarên xwe bişopînin."

# Serkeftina gerîla ji bo gelê Kurd serkeftineke dîrokî ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



**Hevseroka PYD'ê ya bajarê Qamişlo Dilşa Şawîş da zanîn ku her serkeftineke gerîla, ji bo gelê Kurd serkeftineke dîrokî ye û banga xwedîderketina li berxwedana gerîla kir.**

Dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser Herêmên Parastinê yên Medya didomîne û di van êrişan de tevayiya çekên giran û yên kîmyayî bi kar tîne. Li hemberî vê gerîlayên azadiyê berxwedaneke bêhempa dikin û li herêma Werxelê û Tabûra Ereban derbên giran li dagîrkeran dan û neçar kirin ku ji herêmê vekişin.

Li ser mijarê Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) şaxê bajarê Qamişlo Dilşa Şawîş berxwedana gerîla ya li çiyayên Kurdistanê silav kir û wiha got: "Derketina ciwanên Kurd ya çiyayên Kurdistanê û rakirina çekê ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd, pêkanîna azadî û rizgarkirina wî ji siyaseta qirkirinê ye."

Dilşa Şawîş axaftina xwe wiha domand: "Li hemberî êrişên hovane yên dewleta tirkî ku balafir û çekên kîmyayî bi kar tîne, zarokên bi çekên sivik li ber xwe didin. Lê tevî wê hovîtiyê jî gerîla, dewleta tirkî ya ku hewl dide gelê Kurd li herêmên mîna Garê û hwd qir bike, têk bir."

Dilşa Şawîş da xuyakirin tevî ku dewleta tirkî hewl dide desthilatiya xwe bi êrişên ser gelê Kurd bidomîne, lê bi têkçûnên dubare re di rewşa alozî û krîza hundir dijî dibe ku wê û desthilatiya wê bi dawî bike.

Şawîş bal kişand ser demên borî ku li piraniya bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê xwepêşandan hatin lidarxistin. Di xwepêşandanan de banga istiqaleya AKP'ê û serokê wê Erdogan ji ser desthilatê kirin, da ku welatî bi awayekî azad û birûmet li welatê xwe bijîn.

Dilşa Şawîş da zanîn ku dewleta tirkî ne rûbirûyî krîzên hundir tenê ye, di heman demê de krîzên wê yên derve jî, hem welatên cîran hem yên din re hene. Ev jî nîşan dide ku dewleta tirkî di krîzên hundir û derve de dijî û wê binketin û têkçûnên wê li çiyayên Kurdistanê wê têk bibin.

Dilşa Şawîş diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker nikare hêzên gerîla û gelê Kurd têk bibe û got, lewra her Kurd gerîla ye û her Kurd piştgiriya berxwedana gerîla dike.

Di dawiyê de Dilşa Şawîş bang li gelê Kurd, bi taybet ciwanan kir ku tevlî berxwedana gerîla bibin û piştgiriya Pêngava Cenga Şoreşgerî ya Xabûrê li çiyayên Kurdistanê bikin û li hemberî dagîrkeriya tirkî her çar parçeyên Kurdistanê bibin yek û diyar kir ku her serkeftina hêzên gerîla ji bo gelê Kurd serkeftineke dîrokî ye.

**Fener…..**



## Li Pêşxabûrê israra xweşibandina celadan ya Kurdên 'kêrhatî'!!

**Idrîs Henan**

Kurd qewmê herî zêde hatiye asîmîlekirin û qelandin. Ji lewra bi hêsanî hatiye parçekirin û mêtinkirin ku qeta wî ya teslîmkar zûbizû adepteyî çanda celadê xwe bûye. Ewqas bi serhişkiya xwe binavûdeng e lê bi qasî wê jî sernerm bûye ku li hemberî dozên xwe yên neteweyî bêwijdan û bêexlaq bûye.

Nasnameya xwe ya berxwedanê ji dest daye û ji bo elîtên serdest koleyê kêrhatî bûye. Çi ji destê wan hatiye ku bişibin efendiyên xwe kirine û ta ku bibin dûvikên sîstemê û cihekî di nav de bigirin, bi hêsanî dest ji nasnameya xwe ya civakî terikandine.

Ev teşeyê Kurdê han ê hatiye asîmîlekirin û qirkirin, biryar û çalakiya xwe ya azadiyê ji dest daye. Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan di vê xisûsê de gotiye: "Kirine ku bi tevahiya nirxên nasnameya xwe ya civakî re xiyanetê bike. Kirine ku bibe mîna heywanekî di şiklê mirov de û bi tenê li pey ziktêrkirina xwe ve biçe".

Îro jî PDK'ê û dûvika wê ya leqleqok ENKS'ê temsîla karakterê Kurdê "Kêrhatî" dikin ku bi danesîna wan re asta koletiya ku dijîn nîşan dibe. Hewl didin danesîna rast şîlo bikin û xwe nedin dest û weke hewcedariyeke destjênebe xwe didin ferzkirin. Şêwazên xwedanqebûlkirinê çi dibin bila bibin, a girîng xweşibandina celadê xwe ye û pratîzekirina nirxên wî ye. Ji lewra; ne cihê sosretê ye ku PDK'ê cenazeyên şervanên azadiyê radestî malbatên wan nake. Beriya wê jî PDK'ê cenaze girtibûn. Bi xweşî dîl girtibûn û qetil kiribûn û li pey siwareyan xişandibûn. Ne tiştekî ewqas ecêb e ku mirov li hemberî kiryarên li ser dergeha Pêşxabûrê rû dabûn matmayî bimîne. Di cewherê van kiryaran de têkîliya desthilatdariyê û dewletê heye. Ango, kiryarên PDK'ê hewldaneke desthilatdariyek koleyên hatine kedîkirin ku bi formên dewleta di bin ebeya mêtinkaran de xweîfadekirin e. Di heman demê de PDK'ê dixwaze bi van sûcên xwe yên derneteweyî bibêje ku ew dilsozê mêtinkarên xwe ye û di pêşbaziya xwedanqebûlkirina bi efendiyan re bi israr e.

Ji aliyekê din ve dema ku mirov li buyer û qewimînan dinêre, her wiha bertek û daxuyaniyên derdikevin, paralelî rûdanên li ser erdê, têdigihêje ku nêzîkatiyên serdestan ne rasthatî ne. berevajî; bi plan û ecîndeyên dûrûdirêj in. Yên fena PDK'ê û ENKS'ê jî tenê amûrên kêrhatî yên pratîzekirin û skendalên li ber çerxa azadiya gelê xwe ne. Ji bona armancên neyaran ên tunekirin û qetlikirinê, alavên bisûd ên dest jê nabin. Mîna girêka kanserê dawerivîna çaviyên civakê.

Girîng e ku mirov van rastiyên PDK'ê û dûvikê wê ENKS'ê ku parçeyek çeteyên Itîlaf û DAIŞ'ê ne zanibe. Ji bo têgihaştinek civakî ya giştî were çêkirin pêwîst nake em dîroka wan vekolin, tenê çend rojên derbasbûyî em binêrin em dê bibînin ka idîayên wan yên "entelektual û netewparêziyê" jî çiqas rast in? Gelo dema ku kesek weke Akkar dibêje ku tiştekî bi navê Kurdistanê nîne û ne jî nas dike, wê çaxê ka xîret û qaşo netewtparêziya wan? Dema ku yekî beredayî yê fena Soylo di bin qubeya parlamantoyê de li ser jinek Kurd qebedaytiyê dike, ka "mêrxas û gernasên" ku li Pêşxabûrê gule li malbatên şehîdan berdidan? Dema ku bêeslekî weke Oglo tekez ku nahêle danûstandinên Kurdan bi ser kevin, ma ew zilam nizane kî di bin ebeya kê de ye? Dema ku çeteyekî terrorîst ê mîna Al-Sêcerî ku xwîna zarokên Kurdan di stuyê wî de ye, ji "serkirdeyên" ENKS'ê dixwaze ji ber serokê xwe Siûd Mile ve lêborînê ji tevgera terorîstên Tirkiyê ya bi navê "Itîlafê" bixwazin, ew jî derhal pêk tînin, ev ne bêxlaqî û bêwijdaniya Kurdê hatiye asîmîlekirin û koleyê mêtinkaran ê herî kêrhatî bin, çi ne gelo?